

Standerdkirina Awayê Nivîsandina Zimanê Kurdî – Zaravayê Bakur

Mijar

Di awayê nivîsandina zimanê kurdî de îro tevliheviyeke mezin heye. Daku zimanê me yî nivîskî cihê xwe baş bigire û di hemû waran de bi awayekî fermî bê bikaranîn, divêt awayê nivîsandinê bê standerdkirin, qeyd û destûrên pêkanîna gotinan û wergirtina gotinên ji zimanên biyanî bîn çespendin.

0. Destpêk

Piştî ku rewşenbîrê mezin Mîr Celadet Bedirxan bingeha awayê nivîsandina zaravayê Kurmanciya Bakur bi tîpen latînî ji nû ve danî, zimanê me yî şêrîn di gelek rewşên dijwar re derbas bû. Sedsala 21ê jî destpêkir, lê mixabin doza Kurd û Kurdistanê hên jî çareser nebûye. Zimanê kurdî jî hên nebûye zimanekî standerd, ji ber ku rewşa wî heya radeyekê bi

çespondina desthilata rêzanî ve grêdayî ye. Lê dîsa jî, di vî warî de gavên gelek hêja hatine avêtin, ku îro gelek dezgeh û weşanên me peydabûne, ewên ku zimanê kurdî bi awayekî fermî bi kar tînin.

Awayê nivîsandinê hin bi hin cihê xwe digire, lê gava dezgeheke zimanî rêberiyê di vî warî de bike, emê hên zûtir bigihînin zimanekî standerd.

Gelek diyar e, ku pir pirsên di vî warî de li benda bersivê ne û hin asteng jî divêt bêne çareserkin. Ka em, wek nimûne, hin pirsan bînin ber çavan.

Pirs1: Navê bajarê herî mezin li Tirkiyê çawa tê nivîsandin?

Ma gelo kîjan şêwe ji van rast e?

Pirs2: Navê “Tirkiyê” çawa tê nivîsandin?

Stanbol – Stenbol – Stanbûl – Stenbûl
Istanbol – Istenbol – Istanbûl – Istenbûl
Îstanbol – Îstenbol – Îstanbûl – Îstenbûl
Stambol – Stembol – Stambûl – Stembûl
Istambol – Istembol – Istambûl – Istembûl
Îstambol – Îstembol – Îstambûl – Îstembûl

Tirkiyê – Turkiye – Tirkiyeyê
Turkiyê – Turkiye – Turkiyeyê
Tirkîyê – Tirkîye – Tirkîyeyê
Turkîyê – Turkîye – Turkîyeyê

Polîtîka ziman.	Zarava û devokên me.
-----------------	----------------------

Zimanê devkî û zimanê nivîskî

Gava em li van herdu hevokên jêrîn guhdar
dikin

Tu yê kengê bêyî ba min
Tê kengê bê ba mi

em tu cudahiyê di maneya wan de nabînin.
Înformasiyona di herdiyan de mîna hev e. Lê
belê gelek diyar e, ku ji hevoka pêşîn hin tişt

hatine avêtin û wisa hevoka dudiyan
pêkhatiye.

Bi gelemperî, piraniya mirovan di awayê
bilêvkirina gotinan de zexel in û ji ber wê,
heya ji wan tê, gotinan kin û kêse bilêvdikin;
bê guman, bi mercê ku yê guhdar mebesta wan
têbigihîne.

Divêt li ber çav bê girtin, ku ev pêvajoyê han ji
sedsalan û hezarsalan de bi bandor û hîkar e û
bi vî awayî hemû zimanên ku li cîhanê hene
herdem di guhertinê de ne. Gava piraniya
gelekî, ji ber hin mercên siyasî û dîrokî zimanê
nivîskî bi kar neyîne, piştî demekê, dikare
rewşeke wisa peyda bibe, ku ew nema baş ji
zimanê nivîskî fêmdike û ew welat neçar dibe,
ku rêformekê di zimanê nivîskî de pêkbîne,
daku li gel zimanê devkî bigunce. Zimanê
devkî dikare di hundirê welatekî de li her
herêmekê bi awayekî din bê guhertin û wisa
zarava û devokên têvel peyda bibin. Lê belê
gava piraniya gel zimanê nivîskî bikarbîne,
herku diçe yekîtiya ziman xurt dibe û rê li
peydabûna zarava û devokan tê girtin.

Pêvajoyê guhertinê

Yên ku di ziman de bi gelemperî têne guhertin yan jî avêtin di pileya pêşîn de dengdêr in. Bi guhertin û avêtina dengdêran tenê ahengiya ziman tê guhertin, lê belê ziman ewqas jî hev nakeve. Gava dengdar tînan guhertin yan jî avêtin, hîngê ziman jî bîngehê de tê guhertin û jî jêder û çavkaniya xwe hin bi hin bi dûr dikeve. Wek nimûne, em gotina „Kurd“ li ber çav bigirin.

Ka em dengdêra „u“ bi hin dengdêrên din biguhêrin:

Kurd – Kird – Kîrd – Kûrd

Kard – Kerd – Kord – Kêrd

Tevî guhertina dengdêrê, gotina „Kurd“ hên baş tê naskirin.

Ka em vê carê dengdaran biguhêrin. Dengdara „r“ dikare bibe „l“, wek gotina „girover“ → „gilover“:

Kurd - Kuld

Em dibînin, ku gotina „Kuld“ ji gotina „Kurd“ gelek bi dûr dikeve.

Ka em vê carê dengdara „ d “ bikin „ t “
Kurd – Kurt

Tevî ku dengdarên „d“ û „t“ Ji yek cihderkê ne, yanê pir nêziya hev in, dîsan jî gotina „kurt“ ji gotina „Kurd“ gelek bi dûrketiye; di zimanê me de maneyeke xwe ya din heye.

Careke din em tîpa „K“ bikin „X“, ku ev jî guhertineke gengaz e.

Kurd – Xurd


Cara dawî, ka em herçar tîpan biguhêrin, em

K bikin X, u bikin a
r bikin l, d bikin t

û em wisa gotina „Xalt“ pêk bînin.

Ma gelo kî yê bawer bike, ku gotinên „Kurd“ û „Xalt“ guhartoyên hev in?

Pêwendiya dengdêran û nîvdengdêran



Gava di gotinekê de du dengdêr li pey hev tèn tiştêkî wek dijayetiya dengan çêdibe. Daku em bi hêsanî ji dengdêrekê derbasî ya din bibin, em nîvdengdêrekê dixin navbera wan. Wek tê zanîn, sê tîp hene, ku em wan wek nîvdengdêr bi kar tînin: **y, w, h**

Li gor nêzîkahiya herdu dengdêran ji kîjan nîvdengdêrê ve, em wê nîvdengdêrê dixin navbera wan. Bi gelemperî nîvdengdêra “**y**” vê rolê dilîze, lê hin caran nîvdengdêrên “**w**” û “**h**” tèn bi kar anîn.

Hin nimûne:

I. tenê “y”

- a. bayê sar,
- b. keyayê gund,
- c. rêya dûr,

II. tenê “w”

- a. ew bawî bûye (ji gotina „ba“ pêkhatiye)
- b. ew tawî bûye (ji gotina “ta” pekhatiye)

III. „y“ yan jî „w“

- a. Xwedêyo, Xwedêwo

IV. “y”, “h”

- a. paleya genimê sor, paleha genimê sor
- b. ez tirsiam, ez tirsiam
- c. ez pê hesiam, ez pê hesiam

V. “y”, “w”, “h”

- a. zia bûye, zia bûye, zia bûye
- b. duem, duem, duem

Teraziya dengdêran û nîvdengdêran

ey ≈ ê peydabûn, pêdabûn

peywendî, pêwendî

wî ≈ u xwîrt, xurt

wî ≈ û xwîşk, xûşk

gwîz, gûz


mewîj, mûj

eh ≈ ≈a çehl, çal



ih ≈ ≈î mih, mî

Ev mijareke taybetî ye û em naxwazin li vir bi ferehî li ser rawestin.

1. Guhertina dengdêran: “a” ↔ “e”:



a. Hin daçekên me



bi pêş va, bi pêş ve, ... ,
pêşva, pêşve,
pêşda, pêşde,
paşva, paşve, ,

b. Hevgirtina daçek û pronav

bi wê(wî) ra bi wê(wî) re
pêra pêre

pêra, pêre, jêra, jêre, têra, têre
pêva, pêve, jêva, jêve, têva, têve
pêda, pêde, jêda, jêde têda, têde


c. Navdêrên nebinavkirî

hezaleka kurdan, hezaleke kurdan,
keçeka bedew, keçeke bedew, ..

Hin guhertinên ku hên baş rûneniştine ev in:

guhartin, guhertin,
xwastin, xwestin,
xwandin, xwendin,
xwarin, xwerin, ...

2. **Guhertina dengdêran: “ e ” ↔ “ ê ”,**
“a” ↔ ” ê ”:



Kesandina Lêkeran – Kesê sêhem


- a. ew diçe wir, ew diçê wir,
- b. ew dikeve, ew dikevê, ..

Tewanga navdêran

- c. bajar → bajêr
- d. Azad → Azêd

Ev herdu şimitandin û yê wisa divêt pekneyên


Guhertina dengdêran: “ a ” ↔ “ i ”:



- e. axaftin – axiftin
- f. daravtin – darivtin
- g. parastin – paristin
- h. alastin – alistin

Ev herdu şimitandin û yên wisa divêt pekneyên

Guhertina dengdêran: “î” ↔ “ê”:




- i. ez dişînim, ez dişênim,
- j. ez dixwînim, ez dixwênim,
- k. ez dikewînim, ez dikewênim,
- l. ez dimînim, ez dimênim,
- m. ez direvînim, ez direvênim,

Ev şeweyê şimitandinê bi polîtîka ziman ve girêdayî ye. Li ser vê divêt biryar bê girtin.

Guhertina dengdêran:


“a” ↔ “e” ↔ “ê” ↔ “i”:



- guhartin, guhertin, guhêrtin
- xwandin, xwendin, xwêndin
- alastin, alistin, alêstin
- guvaştin, guviştin, guvêştin

Ev şeweyê şimitandinê bi polîtîka ziman ve girêdayî ye. Li ser vê divêt biryar bê girtin.


Guhertina dengdêran: “ i ” ↔ “ e ”:



- n. bihar, behar,
- o. fireh, fereh,
- p. hiş, heş
- q. bihuşt, behuşt, buhişt, beheşt, bihişt,
- r. mixabin, mexabin ..

Ev şêweyê şimitandinê bi polîtîka ziman ve girêdayî ye. Li ser vê divêt biryar bê girtin.


Guhertina dengdêran: “ i ” ↔ “ u ”:



- s. bihar, buhar, ...
- t. hinguv, hunguv, hungiv, hingiv, ...
- u. hurç, hirç, ,

Ev şeweyê şimitandinê bi polîtîka ziman ve girêdayî ye. Li ser vê divêt biryar bê girtin.


Guhertina dengdêran: “ o ” ↔ “ û ”:



- v. sond, sînd
- w. kor, kûr
- x. bor, bûr
- y. dor, dûr

Bi dîtina min şeweyê “û“ ji yê „o“ baştir e; lê dîsa jî divêt biryar bê girtin.

Guhertina dengdêran: “a” ↔ “eh”:



mar (ev baş e û niha tê bikaranîn)
mahr

me`hr

çal (ev baş e û niha tê bikaranîn)
çahl

cehl


tal (ev baş e û niha tê bikaranîn)
tahl

tehl

pan (ev baş e û niha tê bikaranîn)
pahn

pehn

3. Guhertina dengêran: “îh” ↔ “î” ↔ “ih”:



mîh mî
 mîh mih

cîh cî
 cîh cih

sîh sî
 sîh sih

rîh rî
 rîh rih

Li ser vê divêt biryar bê girtin.

4. Wergirtina gotinan ji zimanên netewên cîran(cînar, hevsê, hawsê), hin nimûne:

- i. Emir(e) – ferman,
- ii. kerem ke(e+k), bûrin(t) – fermo
- iii. resmî(e) – fermî
- iv. hêsîr, yêsîr – dîl
- v. qetil kirin – kuştin
- vi. jîyan ji dest dan – mirin
- vii. mamoste (mam + hoste), hîndar, ustaz, ûstaz, hostaz, ûstad(f)
- viii. qelem, xame, defter, wezîr, dewlet, sera, dîwan, mane,

Gotinên me hene lê em diçin hinên din durist dikin.

Mehmûd	Mehmut
Ehmed	Ehmet
Memed	Memet
Ferhad	Ferhat
Bedlîs	Bîtlîs

Li vir divêt bingeha gotinê bê parastin.

12. Wergirtina bêjeyan ji zimanên biyanî:

Nimûne: *Xwe ji hegemonyan rizgar dikirin*

Studio – **studiyo** – studyo

Mafia – **mafiya** – mafya

Affiche – **afiş** – afiş

Institut – **înstîtût** – Enstîtû

Information – **înformasiyon** – înmasyon

Plan – **pilan** – pîlan

Grup – **girûp** – grûb

•

Bi dîtina min, di wergirtina gotinan de ji zimanên ewropayî, şeweyê pêşîn baş e, yê dawîn ne baş e.

13. Nixteşanî:

Di vê hevoka jêrîn de divêt bihnok (yanê ,) li kûderê bê danîn?

Belê dema êvarê dayîka min sêlikên Eyşe Şanê yek bi yek datanîn ser qewanê dengê wê her dera mala me tîjî dikir.

Ez dibêjim, divêt bi awayê jêrîn be:

Belê, dema êvarê dayîka min sêlikên Eyşe Şanê yek bi yek datanîn ser qewanê, dengê wê her dera mala me tîjî dikir.

Di vê hevokê de cihê bihnoka dawî bi mana gotina “qewanê” ve girêdayî ye. Gava qewan bi mana sazê ku mirov sêlikan datîne ser be, hîngê divêt bihnok li pişt gotina “qewanê” be, lê gava “qewan” ji taybetiyên deng be, hîngê divêt bihnok berî gotina “qewanê” be. Ez bawer im, ku mebest ji qewanê sazê sêlikan e.

Weke Şakiro dibêje | şaneşîn mîna balkonê ye. Balkonên li apartimanan diyar dibin, ku dema germê mirov kursiya xwe lê deyne | bi qeremaçê bileyize û şîroveyên siyasî yê dema talî bîne ziman. Bi ser qeremaçê û siyasetê de | yan kahweyekê | yan jî bîrayekê vexwe. Yanî balkon | an jî şaneşîn | cihê stirahtê ye. Weke Şakiro dibêje | cihê razana rojên havînê ye. Rojên germ û germistanan, şaneşîn bi dest herkesî nakeve. Tew hên dilberek çongên xwe bike balgî, mirin hebe jî, emrê Xwedê ye...

Em dibînin ku li hin cihan bihnok pir pêwîst e, lê li hin cihên din ne ewqas pêwîst e, belê gava hebe hevok hên baştir tê xwendin.

Zimanzanên kurd û Mîr Celadet:

1. Pîrsa “ î ” li pêş “ y ” û avêtina kumikê tîpên din.

kirîn – min kiriye

kirin – min kiriye

pêşneyar: Tenê kumikê „î“ bê avêtin. Avêtina kumikê yên din pêwîst nake.

2. Tîpa dubare

a. xurt + tir = xurttir ↔ xurtir

b. şer + rawestandin = şerrawestandin ↔ şerawestandin

c. serok + komar = serokkomar ↔ serokomar

d. ziman + nas = zimannas ↔ zimanas

e. ...di çavên min de ev kêmayiya ku em dibînin, neynikkirina rastiya rewşa gelê me ye.

f. ...xeyalên wî yên hînbûna xwendin û nivîsê êdî ketibûn rastiya bicihhatinê.

g. Serrûpela Nûdemê.

h. Destteng, nîvvekirî, nîvvala, çarrûpelî, ...

3. Tîpên ji yek cihderkê

Nimûne: bilind + tir = bilindtir; ne wek
Celadet "bilintir"

- i. Dengkirina me li ser zimanê kurdî bû.
- j. Me ji ber derd û kovana jidestayîna
hunermendê mêrxas Ahmad Kaya hê
hêsirên çavên xwe
- i. Di pênc salên desthilatdariyê de ...

Li ser van pêşneyaran divêt biryar bê girtin.

Pirsa du dengdêrên li pey hev:

Dilê min jî di demên wisa de, ji bêaviyê
ziwa dibe û wekî axa Heranê diqelişe.

Di dilê min de êşek peyda dibe, piştî ev êş
diavêje mejiyê min û cara dawîn jî wekî
guleya mawîzerê, can û cesedê min qul
dike û derbasî aliyê din dibe.. (M. Baksî).

...diaxêve, dialêse, dienire...

Li ser van pêşneyaran jî divêt biryar bê girtin.

Pirsa nêr û mê

Celadet dibêje, ku Kurd li ser zayendê
pênc gotinan li hev nakin; ew jî ev in:
kursî, sîng, dem, çax, wext

Lê belê îro wisa lêhatiye, ku her navdêrek
di bin gumanê de ye, ka gelo ew nêr e, yan
mê ye?

Li cihê „Kurdistanek**e** azad“ dibêjin
„Kurdistanek**î** azad“

Li cihê „beş**ê** zanistî“ dibêjin „beş**a**
zanistî“

Divêt zayendê her navdêrekê diyar be.